

# Çîroka Jîyanê

## Çandin û cotyarên de stpêkê

Berî 12 hezar salan li binarê çiyayê Zagros, li Kurdistana me mirovan dest bi çandinê kir. Bi çandinê guhurîneka mezin di jîyana mirovî da çêbu. Mirov berî çandinê weku hemu cenawerên di bi rojê hemuyê xwarinê di gerîya û dema dinya tarî bu xwe dida ber cihekê heta dinya rûn dibu û rojeka di pir sext û rûdan di jîyana wî da destpê dikir.

Lê piştî fêrî çandinê buy xweş bû û hêdî hêdî xanî avakirin û ew xanî bûne gund û bajêr. Digel çandinê mirovan dest bi ke hîkma ajelan jî kir ji bo guşt û şîr û pîstê wan û her wesa hindêk ji bo zêrevanîyê û karên giran û helgirtina baran jî bi kar înan. Her di vê qunaxê jî da bû, mirovan dest bi çêkirina cilka ji pîst û hûrîyê ajelan kir û aman jî wek cerk û gozka ji herîyê çêkirin.

## Dirûn..

Mirovên hîngî berê hisanî bi kar tîna ji bo dirûna genmî, wek di vî wêneyê bizarvekirî da dîyar dibe.



## Kehîkirina ajelan..

Kehîkirina ajelan ji wê çendê destpê kir dema mirovan têjkên caneweran digirtin di înanê dev xwe û di gel borîna demî êdî zanîn kîj canewer kehî dibin û kîjan kehî nabin. Ji canewerên mirovan li destpêkê kehî kirin: se, bizin, mîh û çel bûn.

## Genim

Yekemîn çandin mirovan kirî çandina genmî bû ku bi xwe şîr dibû paşî mirovan tovê wî çinîn û çadin.





Her wek di vî  
wêneyê bizarvekirî  
da dîyar dibe, miro-  
van ber yan corekê  
distarî bi kar di îna  
ji bo hêrana genimî

Aman bi vê  
rêkê ji herîyê  
di hatne çê  
kirin.



## Bajêr..

Şûmwarên kevintirîn  
bajêr di dîrokê da  
heta niha hatine dîtîn,  
şûmwarên bajêrê(çetel  
hoyûk) buye ku dîroka  
wî vedigere berî(9)  
hizara salan û dikev-  
ee Tirkîya evro. Wek  
di wêneyî da diyare:  
Xanî wekî xaniyên  
gundên me ji teqne  
dihatne çêkirin û  
banên wan bi  
garea û nîrha di ha-  
tine dapoşîn. Tiştê  
seyr di van xaniyan  
da ew bû, ku  
pencerên wan di  
biçûk bûn û  
dergeh nebûn.

şûna dergehî pencerek di banî da bû  
bi rêka payîskê di çûne jor û dertkev-  
tin. Ne dûre jî wan ev xaniyê hosa  
çêdikrin da ku bi şevê xwe ji canew-  
erên dirinde biparêzin

